Kurdiname Akademik

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Uluslararası Kurdiname Dergisi
International Journal of Kurdiname

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Jimar: 8 Nîsan 2023

International Journal of Kurdiname
Issue: 8 April 2023

https://dergipark.org.tr/en/pub/kurdiname **E-ISSN**-2687-5438

# DI HELBESTÊN FEQÎYÊ TEYRAN DA DILNIZMÎ

FAKÎ-YÎ TEYRAN'IN ŞİİRLERİNDE TEVAZU

MODESTY IN THE POEMS OF FEQI TEYRAN

Nesim SÖNMEZ•

**Article Type:** Research Article // Gotara Lêkolînî
**Received // Hatin:** 28.02.2023
**Accepted // Pejirandin:** 14.04.2023
**Published // Weşandin:** 29.04.2023
**Pages // Rûpel:** 1-12
**DOI:** 10.55106/kurdiname.1257473

This work is licensed under the Creative Commons Attribution International License (CC BY 4.0).http://creativecommons.org/licenses/by/4.0/

**Citation/Atif:** Sönmez, Nesim (2023). Di Helbestên Feqîyê Teyran Da Dilnizmî, *Kurdiname*, 8, p. 1-12

**Plagiarism/Întîhal:** This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website // *Ev gotar herî kêm ji alîyê 2 hakeman va hatiye nirxandin û di malpera întîhalê ithenticate ra hatiye derbaskirin.*

## Kurte

Helbesta kurdî ya klasîk, çalakîyeke hunerî û dewlemendîyeke wisa kûr û berfireh e ku ew di tevahîya qonaxên jîyana mirovan da cih digire û cîhana wan a bawerî û ramanîyê dorpêç dike. Di helbesta klasîka kurdî da mirov dikare ji her alîyê jîyanê, cihêreng fezîlet û qelsîyên xewn û xeyalan, îdeal û armancên mirovan bibîne û wan bixwîne. Ji wan alîyên jîyanê yek jî dinizmî ye ku ew, di serî da li hember Xwedê û li pêşberî kesên din wekî biçûkdîtina nefsa xwe hatîye fêmkirin û wekî karekî hêjayî pesindarîyê hatîye pêşnîyazkirin. Feqîyê Teyran jî yek ji şairên edebîyata kurdî ya klasîk e ku wî, di helbestên xwe da gelek caran dinizmî û nefspiçûkîya xwe nîşanî xwînerên vê edebîyatê daye.

Di vê gotarê da helbestên Feqîyê Teyran di ber çavan ra hatine derbazkirin û ewên ku eleqeya wan bi dilnizmîyê ve hene, hatine tesbîtkirin û di çarçoveya mijarê da hatine helsengandin.

**Peyvên Sereke:** Edebîyata Kurdî ya Klasîk, Helbest, Feqîyê Teyran, Nefspiçûkî, Dilnizmî.

## Özet

Klasik Kürt Şiiri, insan hayatının her evresinde yer alan, onun inanç ve fikir dünyasını derinlemesine kaplayan zengin bir edebi sanatın adıdır. Klasik Kürt şiirinde, hayatın her alanında; insanın faziletlerini, zaaflarını, hayallerini, ideallerini ve ilkelerini görmek ve okumak mümkündür. Hayatın bu alanlarından birisi de, Allah'ın ve diğer insanların önünde kendini küçük görmek diye tarif edilen ve övgüye değer bir eylem olarak görülen mütevazılıktır. Faki-yî Teyran, Klasik Kürt edebiyatı şairlerinden biri olup, şiirlerinde tevazu ve alçak gönüllülük konusunu birçok defa dile getirmiştir.

Bu makalede Faki-yî Teyran'ın şiirleri gözden geçirirlmiş, mütevazılık konusu ile ilgi beyitler tespit edilip konu bağlamında irdelenmiştir.

**Anahtar Kelimeler:** Klasik Kürt Edebiyatı, Şiir, Faki-yî Teyran, Tevazu, Alçak Gönüllülük.

• Doç. Dr., Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê, Enstîtûya Zimanên Zindî, Beşa Ziman û Çanda Kurdî
E maîl: nesimsonmez@yyu.edu.tr, ORCID: 0000-0002-6315-6075

## Abstract

Classical poetry, which we call classical Kurdish poetry, is the name of a rich literary art that takes place in every stage of human life and deeply covers his world of belief and ideas. In classical poetry, it is possible to see and read human virtues, weaknesses, dreams, ideals and principles in all areas of life. One of these areas of life is humility, which is described as humiliating oneself in front of Allah and other people, and is seen as a praiseworthy act. Faki-yî Teyran is one of the poets of classical Kurdish literature and has dealt with the subject of modesty and humility many times in his poems.

In this article, Faki-yî Teyran's poems were reviewed, couplets related to the subject of modesty were determined and these couplets were examined in the context of the subject.


**Keywords:** Classical Literature, Poetry, Faki-yî Teyran, Humility, Modesty.

## Destpêk

Feqîyê Teyran (1564[?]-1631[?]) yek ji mezintirîn şairên edebîyata kurdî ya sedsala 16an û 17an e. Helbestên ku wî, li pey xwe hiştine gava di ber çavan ra têne derbazkirin bi awayekî zelal tê xwîyakirin ku ew; di warê işq, felsefe, tesewuf û rewanbêjîyê da pispor e. Şairî, helbestên xwe ne bi zimanekî giran berevajî bi zimanekî hêsan nivîsîne. Di naveroka helbestên wî da, ew exlaqê ku di bin tesîra çanda îslamê da derketîye û bi rengê felsefe û tesewufa îslamê hatîye boyaxkirin û pêşda çûye bi îfadeyên herî desthilatdar derdikevine pêşberî me. Zimanê helbestên wî, her çiqas hêsan be jî ji warê maneyê ve jî ewqas kûr e û mirov dikare bibêje Feqîyê Teyran di helbestên xwe da hunera sehlê mumtenî baş bi kar anîye.

Feqîyê Teyran, di helbestên xwe da gelek caran rengê exlaq û çanda îslamê anîye ziman û di kemilandina fikr û ramanên wî da tesîra gelek alim û zanayan çêbûye. Mirov dikare di nav wan kesên ku Feqî, di bin tesîra xwe da hiştine da Ferîduddînê Ettar (1146-1221) û Melayê Cizîrî (1570?-1640?) bi lêv bike. Wî, di helbestên xwe da bi gelemperî işq, exlaq û felsefeya tesewufê bi awayekî berbiçav vehûnandîye. Şairî, di helbestên xwe da ji çavkanîyên edebîyata klasîk yên di warê dîn, exlaq û tesewufê da sûdeke baş wergirtîye û ev sûdwergirtin di bikaranîna ziman û uslûba wî da bi awyeke zelal tê xwîyakirin. Feqîyê Teyran, wehareng li ser alim, zana, mutesewuf, şair û edîbên pişt xwe ra jî bandoreke berbiçav kirîye.

Feqî, di helbestên xwe da ji ayet û hedîsan gelek caran îqtîbas kirîye, bûyerên dîrokî bi rêka hunera telmîhê anîye ziman û girîngîyeke berbiçav daye ronîkirina nirxên çanda ku ew têda jîyaye.

Dilnizmî an jî bi gotineka din nefspiçûkî di edebîyata kurd ya klasîk da bi taybetî jî di helbestên Feqîyê Teyran da hatine bilêvkirin. Di demajoya vekolînê da li ser vê mijarê em, rastî xebateke akademîk nehatin. Ji ber vê yekê me, ev xebat hilbijart û di vekolînê da em li ser hûr bûn. Di vekolînê da me, helbestên Feqîyê Teyran yek bi yek di ber çavan ra derbaz kirin û ew malikên ku eleqeya wan bi mijara me ra hene tesbît kirin. Xebatên ku heta roja îroyîn li ser Şairî hatine kirin jî ji me ra bûn çavkanî û me gelek mifa ji wan wergirt.

Vekolîna me ji pênc serenavan pêk tê. Di serenava yekem da bi armanca ku mijar baş were fêmkirin, bi gelemperî têgeha nefspiçûkîyê yan jî bi gotineka din dilnizmî hatîye şîrovekirin, di bin serenava duyem da di helbestên Feqî da dilnizmî û pozbilindî, di bin serenava

sêyem da di helbestên Feqî da dilnizmî û xwenaskirin, di bin serenava çarem da di helbestên Feqî da dilnizmî û hezkirin û di bin serenava pêncem da jî Feqîytê Teyran û taybetîyên kesên dilnizm hatîye nirxandin. Em di her pênc serenava da jî, di helbestên Feqî da li bi pey şopa mijara dilnizmîyê ketin, me di helbestên Şairî da rengê bikaranîna mijarê tesbît kir û mijar li gor çarçoveya rê û rêbazên edebîyatê nirxan[1].

## 1. Dilnizmî Wekî Têgeh

Têgeha dilnizmîyê di ferhengê da tê wateya "tevazû, nefspiçûkî, fedakarî û nequretî" yê (Farqînî, 2000: 1131; Îzolî, 2007: 174; Samî, 1998: 447). Di kurdî da gelek caran di dewsa dilnizmîyê da peyva "mutewazî"yê jî tê emilandin. Peyva mutewazîyê bi eslê xwe erebî ye, ji lêkera "we-de-'e" yê hatîye darîştin û di ferhengê da tê maneya nefspiçûkîyê, piçûkxistina rûmet û mertebeya xwe, xwe paqijkirina ji hest û tevgerên ku dibine sedama rûreşîya kesên din. (İbn-î Manzûr, 1984: 397; Çağrıcı, 2011: 583). Ji van maneyên ku li jor derbazbûn tê zanîn ku dinizmî, nefspiçûkî ye û ji kesên nefspiçûk ra mirovên dilnizm tê gotin. Yanê dilnizmî ew tişt e ku mirov kêmasîyên xwe qebûl bike, dev ji hestên ku di her warî da gotinên herî rast ên wî nin, berbide, bi wan tiştên ku ew xwedîyê wan e kêfxweş bibe, dema xeletîyekî dike wî xeletîya xwe qebûl bike, ji bo her xizmeta ku jê ra tê kirin bi spasdarî bersivê bide û ji xwendin û hînkirinê ra jî vekirî be.

Kesên dilnizm, pozbilindîyê nakin, nefsa xwe ji kesên din mezintir nabînin, ehlê kibrê û quretîyê nînin. Xwedê Teala jî di kesayeta pêxemberê xwe Hz. Muhemmed (sxl) da li bendeyên xwe ferman dike ku ew dilnizmîyê wekî exlaqek, ji xwe ra bigirin dev jî pozbilindî û quretîyê berdin weha ferman dike: "*Ji bo bawermendên ku dane pey te xwe perşikestî û nerm bike*" (Şuara: 26/215). Xwedê Teala di vê ayetê da ji Cenabê Pêxember dixwaze ku ew, bibe kesekî dilnizm û herweha vê emrûfermanê li bendeyên xwe jî dike û ji wan jî dixwaze ku ew jî bibin kesên dilnizm, nefspiçûk û xwe ji pozbilindî û quretîyê dûr bixînin.

Lazim e ev têgeh baş were fêmkirin, lewra dilnizmî nayê maneya kirina her cure karên ku xweşî mirovan diçe yan jî liv û tevgerên ku kesayeta xwe li cem kesên din dide binpêkirinê. Eger ev hal û hereket di cih da were emilandin dibe tiştekî pîroz, lê eger di cih da neyê bi kar anîn wê demê ji bo mirov dibe kêmasî. Di dilnizmîyê da quretî û xwe mezin hesibandin tune ye. Kesên dilnizm, di nav civakê da li pêşberî mirovan her daîm dixwazin xwe ji qîmeta xwe ya rasteqînî piçûktir nîşan bidin. Kesên bi xurûr û pozbilind jî nazwazin alîyên xwe yên qels nîşanî însanan bidin.

## 2. Di Helbestên Feqî da Dilnizmî û Pozbilindî

Dilnizmî berevajîyî xwe mezin nîşandan, mezin hesibandin, pesnê xwe dan, zêde ji xwe bawerkirin yanê pozbilindî û kibrê ye. Pozbilindî, nîşaneya xwe mezin hesibandin û xwe ji herkesî baştir û qencîtir girtinê ye. Kesên qure û bi xurûr di dinyayeka xeyalî da dijîn, li gor wan di dinyayê da kesên herî mezin û bi qewet ew in, lewra lazim e herkes hurmetê nîşanî wan bide û li her cih û warî pesnê wan were dayîn. Mirovên wisa, kesên devdora xwe wekî kesên bêqîmet û ji xwe piçûktir dibînin. Di Quranê da Xwedê Teala, li mirovên weha rexneyan dike û dibêje: "*Bi quretî li ser erdê bi rê ve neçe. Bêguman tu (bi giranîya xwe) qet nikarî erdê çal bikî û tu qet nikarî bi çîyan ra berberîya bilindahîyê bikî (tu ji her duyan jî kêmtir î).*" (Nîsa:

---

[1] Di vekolînê da berhema bi navê Feqîyê Teyran. (2022). *Dîwan*, (wergêr û şîkar: Kadri Yıldırım), çapa 2yan, Ankara, weşanên Kültür ve Turizm Bakanlığıyê bi alîkarîya Şaredarîya Dîyarbekirê, bingeh hatîye girtin û di dayîna malikan an çarînan da di nava kevanekê da li gor rêzê hejmara rûpelê û malikê yan jî çarînê hatîye dayîn.

17/37). Ji vê ayetê jî tê fêmkirin ku hewceye haya mirov ji hêz û qeweta wî hebe, ji çarçoveya ku jê ra hatîye dîyarkirin dernekeve, serê xwe li ber qudreta Xwedayê xwe bitewîne, bizanibe ku li hember hêz û qeweta Xwedê ew tu tiştekî nîne, bi bendê dilnizmîyê û nefspiçûkîyê bigire û pişta xwe bide pozbilindîyê û kibrê.

Di rabûn û rûnişkandina ehlê kibr û xurûrê da, di axaftina wan da, di xarin û vexwarina wan da sûnîtî heye. Mirovên wehareng di Quranê da hatine rexnekirin: "*Ji çavsorîyê berê xwe ji mirovan venegerîne û bi quretî li ser erdê nemeşe*" (Loqman: 31/18). Xwedayê Teala di berdewamîya vê ayetê da kesên pozbilind û qure bi awayeke tûj û tund rexne dike û dibêje bila hûn bizanibin ku Xwedayê Teala ji kesên ku weha tevdigerin hîç heznake.

Mela Xelîlê Sêrtî (1754-1843) jî di berhema xwe ya bi navê *Nehcu'l-Enam*ê da ji xwînerên xwe dixwaze ku ew, pozbilindî û kibrê ji xwe dûr bixînin û bi bendê dilnizmîyê bigirin:

*Lîbasê ji bo ferxr û kibrê mepoş*
*Mucerred ji bo ta'etê wî bipoş* (Sêrtî, 1988: 33)

Mirov çi dike bila bike lazim e armanca wî armanceka paqij be, hewceye ew bizanibe ku ne cil û bergên ku ew li xwe dike, ne mewkî û meqamê wî, ne jî mal û milkê wî dibe sedema mezinbûyîna wî, bes kar û xebatên ji dilî yên ku ew, bi nîyeteka paqij û xalis, ne bi armaca kibr û xurûrê dike, pileya kesayeta wî bilind dike û wî di nav benîademan da ezîz û serfîraz dike.

Di nêrînên kesên pozbilind û xwedan kibir da nîyetxirabî heye û ew dema diaxivin bi dengekî bilind û bi peyvên tûj diaxivin. Herweha dema ew diçin cîhekî dixwazin li cihê herî baş rûnin û tevahîya milet jî ji wan ra xizmetê bike. Mirovên pozbilind, ji xeynî xwe bi tu kesî qayîl nabin û ew her xwe dizanin. Herçiqas haya ehlê xurûrê ji hêz û qeweta wî hebe jî ew, tu wextekî naxwaze alîyê xwe yê qels, zeîf û lawaz derbixîne pêşberî mirovan û ew her dem dixwaze wan taybetîyên xwe veşêrîne. Mela Xelîlê Sêrtî, di malikeka xwe da dixwaze mirovan hişyar bike û bîne bîra wan ku ew, ji aveka pîs hatine afirandin û ne lazim e ew, xwe qure û pozbilind bibînin, bileks dilnizmî û nefspiçûktîyê ji xwe ra wekî xwîy û xislet bigirin û xwe ji tevgerên weha nebaş biparêzin. Li gor Sêrtî kibir, nexweşîyek e û dermanê vê nexweşîyê jî dilnizmî û nefspiçûkî ye (Ayğan, 2013 :639). Sêrtî weha dibêje:

*Di nefsa xwe de jî tefekkur bike*
*Ji avek tu ne çêbûyî, lec meke* (Sêrtî, 1988: 25)

Mirovên dilnizm bereksî kesên pozbilind û qure, însanên nazik in xwe ji hestên quretî û kibrê dûr digirin û naxwazin her daîm di serê govendê da bin.

Feqîyê Teyran di qesîdeya xwe ya bi navê "*Ey Av û Av*" da bi avê ra diaxive û jê gelek pirsan dike û dibêje "tu çima ewqas bêsekne û bêrahetî, ma tu bi 'işq û muhbetî gelo tu aşiqê Rebbê xwe yî, ez dixwazim bizanim vê sirê, tu ji kê ra dikî taetê...

*Ey av û av, ey av û av*
*Ma tu bi 'işq û muhbet î*
*Mewc û pêlan tavêy bilav*
*Bê sekne û bê rahet î*

*Bê rahet û bê sekne yî*
*Yan 'aşiqê Baxoy xwe yî*
*Yan şubhetê qelbê me yî*

*Ji emrekî bi lez ketî* (Feqî, 40/1-2)

Bê dest û pê tu ji ku têy, tu hadis î yan qidem î, gelo tu hîkmetê dizanî, ... û hwd.

*Bi dar û dunya setrem î*

*Avê bi Rebbê alemî*

*Tu hadis î yan qidem î*

*Yan tu nizanî hîkmetê* (Feqî, 43/23)

Feqî, di vê helbestê da hunera întaqê bi kar anîye, av daye axiftin û bi rêya vê axiftinê gelek pirs kirine lê, bersiva pirsan bi awayeke zelal dizane û mirov dibîne ku wî di vir da hunerê sehlê mumtenî emilandîye. Eger em van pirsên Feqî, ji alîyê dilnizmîyê ve şîrove bikin dê em ê bibînin dilnizmî û nefspiçûktîyeke çiqas kûr di van pirsan da heye. Lewra gelek caran em dibînin ku pir kes hene gelek tiştan nizanin lê ew ji ber pozbilindî û kibra xwe, ji zanayan bersiva wan pirsan napirsin û meraqa dilê xwe rehet nakin. Feqî, bi van pirsên xwe yên watedar dixwaze hinek mesajan bide me û di van mesajan da bibêje ka binêrin kesekî mîna min pirsên xwe yek bi yek dipirse û li benda bersiva wan e. Lazim e di warê hinbûna ilm û îrfanê da hûn jî bibin kesên dilnizm û kibr û xurûrê bavêjine paş xwe û li ser ilm û hunerê hûr bibin û tiştên ku hûn di derheqê wan da agahdar nînin ji ehlê wan bipirsin.

### 3. Di Helbestên Feqî da Dilnizmî û Xwenaskirin

Mirovê ku xwe nas dike û dikare xwe bi xwe bifikire ew, keseke dilnizm e. Însanê ku rastîya kesayeta xwe dizane û vê rastîyê qebûl dike ew, dikare xwe ji pozbilindî û kibrê dûr bixîne. Mirovên wehareng, ji alîyê derûnîyê ve dikevine alemeka bi aram û ji alîyê rûhî ve jî hêzeke bi qîmet bi dest xwe ve dixînin. Kesên dilnizm û nefspiçûk dikarin xwe nas bikin û di encamê da xwe ji alîyê derûnî û rûhî ve bigîhînin jîyaneka watedar û bi aram.

Însanên dilnizm û nefspiçûk lazim e terazûya dilnizmîyê baş eyar bikin yanê ew li hember bûyerên ku diqewumin, xwe wekî kesîn sûcdar nebînin û kesayeta xwe red nekin. Kesên dilnizm çawa nefspiçûktîya xwe nîşan didin lazim e wisa jî weqarîya xwe nîşan bidin. Mirovên dilnizm ji ber ku xwe nas dikin, xwe wekî kesên piçûk dibînin. Sebeb çi dibe bila bibe, însanên dilnizm ji ber ku ew mirovên serwext in xwe baş nas dikin. Ji bo vê yekê kesên zana û serwext ne lazim e xwe wekî mirovên mezin bihesibînin. Nefspiçûktî ew tişt e ku mirov, li hember rastîyê serê xwe ditewîne û bi dilxweşî û dilrihetî tevdigere.

Ger mirovek bixwaze hestên xwe fêm bike, li pêşîya wî ji xeynî rêya dilnizmîyê tu rêyeka din tune ye. Dema tiştên ku hewceyî qebûlkirinê ne derbikevin pêşberî însanekî, ew red bike an jî tiştên hewceyî redkirinê ne qebûl bike, tê wê maneyê ku ew di nav tevlihevîya hestên xwe da matmayî maye. Hinek tişt hene ku ew rastîya jîyanê ne û eger mirov, wê heqîqetê qebûl bike û bibêje rast e, di alema jîyanê da gelek tişt hene ku ez nikarim wan bi destê xwe bixînim, wê demê alema wî ya derûnî bi aram dibe, ew kes qedr û qîmeta mutewazîbûnê fem dike û bi xwe dixwaze bibe kesek mutewazî (Hökelekli, 2007: 116).

Feqîyê Teyran di helbesta xwe ya bi navê “*Ey Av û Av*” da bi avê ra diaxive û jê gelek pirsan dike û av jî li wî guhdarî dike. Şairî, nabêje ma ji kesekî wekî min ra şerm nîne ez pirsên wehareng dikim, paşê miletê devdora min wê nebêjin ev Feqî, çito mirov e hewceye ew bersiva van pirsan bizanibe. Lê wisa tê xwîyakirin ku ew weha nafikire û pirsên ku di mêjîyê wî da hene yek bi yek dipirse. Piştî qedandina pirsan av, matmayî dimîne û jê dipirse:

*Ev renge dibêt ava zelal*
*Borî li min ku ev çend sal*
*Qet kes nekir ev renge sual*
*Heta gîham vê saetê*

*Heta gîham vê demê*
*Carek nebû di alemê*
*Ebdek ji pişta Ademî*
*Bifikir di ehwalê şetê*

*Kanî dizên şet jê diçin*
*Hingî Xudê da îns û cin*
*Evreng nekir pirsîyar ji min*
*Ji enbîya û ummetê* (Feqî, 43/25-27)

Feqîyê Teyran, bi aramî li avê guhdrî dike, qet nakeve nav gotinên wî, destûr dide ku av tevahîya gotinên xwe bibêje, ji pirsên wî qet aciz nabe û hestên pozbilindî û quretîyê qet li cem wî peyda nabin. Piştî qedandina pirsên avê, Feqî bi dilnizmî û nefspiçûkîyê bersiva avê weha dide:

*Muksî dibê avê we bû*
*Pêxemberan aqil hebû*
*Qet hewceê pirsan nebû*
*Wan dest gîhabû sohbetê*

*Li sohbeta cara ewul*
*Pêxemberan zanî şuxul*
*Eyb e li bal ehlê eqil*
*Teftîş bike mer'îfetê*

*Me'rîfetê teftîş biken*
*Pirsan ji bûna bîş biken*
*Qenc vê qissê teftîş biken*
*Li arîfan kerahetê* (Feqî, 44/28-30)

Feqîyê Teyran, di bersiva xwe da zêdetir bi mutewazî tevdigere, li gor hewa û hewesa xwe tevnagere û dibêje, rast e hetanî vê gavê tu pêxemberekî yan ewlîyayekî pirsên bi vî rengî ji te nekirine. Çimkî ew zana ne, ehlê ilm û îrfanê ne, hewcedarîya wan bi van pirsan û bersivan tune ye, lewra ew ji berê da bersivên van pirsan dizanin.

Feqî dibêje ey av, tu dipirsî û dibêjî te çima ev pirs ji min kirin. Ez bi halê xwe dizanim, lewra:

*Xelqê Xwudê aqil kirî*

*Hem arif û kamil kirî*

*Nûrek di dil da hilkirî*

*'Eslê qissê rê dibetê* (Feqî, 44/31)

Xwedê Teala, hinek bendeyên xwe dema afirandine aqil, ilm, hîkmet û feraseteke baş daye wan û ew bende, dema li van hal û hereketê te mêze dikin dizanin ku tu çima di nav van liv û tevgeranda yî. Mixabin ê mîslê min:

*Ê mislê min bê ilm û xet*

*Mecnûnekî heywansîfet*

*Teftêşa pirsan ew diket*

*Bê rehnuma lehba me tê* (Feqî, 44/32)

Ku nezanê xwendin û nivîsandinê ne û wekî mecnûnî yanê dînokekî heywan sifet in, ew bi rêya pirskirina pirsan û bersivdayîna wan ji mijarê agahdar dibin. Yanî Feqî, dilnizmîbûyîna xwe û mutewazîtîya xwe bi her awayî nîşanî me xwînerên xwe dide û di dilê xwe da tu kursîyekî ji pozbilindî, quretî û kibrê ra danayîne.

**4. Di Helbestên Feqî da Dilnizmî û Hezkirin**

Eger li cihekî dilnizmî hebe teqez li wir hezkirin jî heye. Lewra em dizanin ku dilnizmî, mirovan dixe rêya hezkirinê û bêguman di her hezkirineka rasteqînî da jî nefspiçûkî heye. Eger di dilekî da kursîyê hezkirini tunebe tê wê maneyê ku xweperestî, ew dil dagir kirîye û xwedîyê wî dilî xistîye ser rêyeka eletewş. Kesên ku nefspiçûkî ji xwe ra kirine wekî taybetîyekî, tê wê maneyê ku wan biryar dane ku xwe ji xweperestîyê dûr bixînin. Mezinahîya kesên nefspiçûk, bi ji xwe zêdetir hezkirina ji kesên derdora xwe û xwe piçûktir dîtina ji mirovên derdora xwe, derdikeve meydanê.

Însanên dilnizm, tevahîya mirovan wekî diranên şehî, yek dibînin. Lewra mirovên aqilmend dizanin ku tevahîya benîademan ji bin îradeya yek Xwedayekî derketine û ew jî Xwedayê Teala ye. Bavê benîademan Adem Pêxember e, dîya wan Hewa ye û ev her du kes hevparê tevahîya benîademan in. Hinek benîadem mêr û hinek jî jin hatie afirandin, rengê wan û miletê wan ji hev cuda cuda ne. Di Quranê da behsa vê mijar weha tê kirin: “*Gelî Mirovan! Bêguman me hûn ji mêrekî û jinekî afirandine û me hûn kirine qewm û qebîle da ku hûn (maf û hiqûqê) hev nas bikin. Bêguman li cem Xwedê yê herî bi rûmet ew ê ku bi pêkanîna heq û mafan xwe bêhtir diparêze.*” (Hucurat: 49/13). Ji vê ayetê jî tê fêmkirin ku hinek taybetîyên mirovan li gor xwesteka wan nehatine dayîn û Aferîner li gor emr û fermana xwe ew taybetî dane wan û xwestîye bi benîademan bide zanîn ku ev cudahî nabin sedema mezinahî yan jî piçûkahîya hinek mirovan ji yên din. Lewra tevahîya însanan ji Adem Pêxember û xanima wî Hewayê ne û ew jî ji axê hatine afirandin yanê di esasê xwe da tevahîya mirovan ji heman madeyî hatine afirandin.

Haya Feqîyê Teyran ji vê rastîya jîyanê heye û ew, dixwaze benîademan weha hişyar bike:

*Canê di navê nefsî ye, vêkra hemî bûn beşerî*

*Maka wicûdan fanî ye, er dê bizanî vî derî*

*Eslê ruhê me baqî ye, lew jê nedakin xawerî* (Feqî, 69/18)

Li gor Feqî, canê kû di bedena mirovan da ye nefsanî ye û tevahîya wê beşerî ye yanê ew, fanî ye û bi dawî ye. Eger însan berî her tiştî vê rastîyê bizanibe, ew ê ferq bike ku maka

tevahîya hebûnan jî fanî ye û bi dawî ye. Lê eslê ruhê însanan beşerî yanê fanî nîne û dawî jî ji bo wî hîç tune ye.

*Dê biçine nîva axekê, perda turabê tarî ye*

*Feqî dê rakit rahekê, bi mehdera wî Barî ye*

*Bo çak û parsak bi carekê, li cennet bikin serdarî ye* (Feqî, 69/19)

Tevahîya mirovan di dawîya dawîyê da mirinê tam dikin û diçin xwe dispêrin paxila axê. Ev der jî cihekî sar û tarî ye. Di wê alemê da mafê gotinê, tenê ji bo Xwedê ye û tevahîya benîademan muhtacî şefaeta wî ne. Mirovên baş, paqij, dilnizm û çak di cenetê da dibine serdar û rêber.

*Avek mehîn im kemter im, min cerg û dil bûne birîn*

*Sewda û dîn û ebter im, pabendê vê nefsa le'în*

*Muksîyê jar û bedter im, ferhemnî xeyre'r-rahimîn* (Feqî, 70/20)

Feqîyê Teyran di vê sê rêzikê da dibêje hal ew hal e ku ez ji aveka pîs hatime afirandin, dil û cîgerên min tev birîn in, sewdalî û dîn im, hebûneka bi dawî yanê ebter im û lingê min bi vê nefsa pîsê le'în ve hatîye girêdan, ji bajarê Miksê me, feqîr û zeîf û jar im û êş û kul û keder ji bo min nexweşîyên herî baş in.

Di van sê rêzikan da Feqî, dilnizmîya xwe tîne ziman û dibêje ez ji tevahîya benîademan hez dikim. Lewra em bi tevahî fanî ne û yê baqî dimîne tenê Xwedayê Teala ye. Nehewceye ku Xwedayê Teala ew taybetîyên dane me, em bi sedem wan xwe qure bikin û wekî kesên pozbilind û ehlê kibrê tevbigerin. Lewra ev taybetîyana me, bi xwe bi dest nexistine bileks ew ji alîyê aferînerê me ve ji bo me hatîne dayîn.

**5. Di Helbestên Feqî da Taybetîyên Kesên Dilnizm**

Mirovên dilnizm xwedîyê hinek taybetîyan in. Ka gelo ev xusûsîyet çine? Di bin vê serenavê da behsa hinek xusûsîyetên kesên dilnizm û nefspiçûkan hatîye kirin.

Însanên dilnizm bi aram in, eceletî û dayîna biryarên demildest karê wan nîne. Dema problemek derbikeve pêşberî wan an jî ji wan pirsek were kirin, ew berê difikirin û hinek agahîyan bi dest dixin, biryara xwe didin û piştra wê problemê yan jî pirsê dibersivînin. Dema ew têkevin nav sohbetekê, gotina axêveran nabirin, bi lez û bez nakevin nav sohbetê û bi aramî li benda qedandina axaftina kesên axêver disekinin. Ev xûyûxislet mifayên giranbiha bi wan dide qezenckirin. Lewra mirovên dilnizm, bi aramî hetanî dawîyê guhdarîya axêveran dikin û ew bi vî awayî ji alîyekî ve mirovên ku bi wan ra diaxifin bi berfirehî wan fêm dikin û ji alîyê din ve di axaftina xwe da, xwe ji bi lêvkirina gotinên nerast dûr dixin û xwe ji poşmanîtîyên ku bi sedem lezkirinê derdikevine meydanê xilas dikin. Ev xusûsîyet tenê wekî edeb nayê hesibandin, digel vê yekê dilnizmîyê jî bi xwe ra tîne. Lewra kesên ku dixwazin hema ew tenê biaxifin û nahêlin mirovên li hember wan axaftina xwe biqedînin, ew him xweperestina di dilê xwe da îfşa dikin û hem jî pozbilindî û quretîya xwe nîşan didin.

Kesên dilnizm, dizanin ku tiştên ew dizanin û dibêjin bêkêmasî nînin û ew bixwe jî kesên kamil nînin. Ji ber vê yekê mirovên nefspiçûk di heman demê da însanên xweşbîn in. Însanên dilnizm, her dem li pey şopa rastîyê ne û dema rastîyê dibînin wê qebûl dikin. Ew, dema bi alimên ji xwe mezintir ra têkilîyan datînin an jî ji wan tiştekî dipirsin di warê edeb û

hurmetkirinê da hîç kêmasîyan nakin, bi dil û can wan guhdarî dikin û dixwazin ji wan sûdeke baş werbigirin.

Dilnizmîya Feqîyê Teyran, di muşaereya ku di navbera Melayê Cizîrî û wî da derbaz dibe da mirov bi awayekî zelal û berbiçav dibîne. Wekî mînak Feqîyê Teyran weha dest bi axaftina xwe dike:

*Selama min heqîrî, sedefek tivê têken*

*Îro di Cizîrê, heqq e li Melê ken*

*Ku ji derba tîrê derman heye lê ken* (Feqî, 71/1)

Feqîyê Teyran di vê malikê da hurmeteka mezin nîşanî Melayê Cizîrî dide. Lewra ew, Cizîrî ji xwe ra wekî alimekî mezin qebûl dike, dixwaze di axaftina bi wî ra da hîç bêhurmetîyê neke û ji ilm û îrfanîya wî sûdê werbigire. Ew, xwe wekî kesekî jar û heqîr dibîne digel vê yekê Mela jî kesekî alim û qedirbilind dizane û wisa bi wî ra muamele dike. Bi şandina selamê dest bi gotina xwe dike û dibêje ez kesekî jar, belengaz û heqîr im, digel vê yekê Mela kesekî bêhempa ye, ji ber vê yekê selama xwe dike hundurê sedefê û ji Mela ra dişîne.

Di edebîyata klasîk da têgeha “sedefê” wekî sembola bereket û comerdîyê hatîye qebûlkirin. Lazim e mirov, masîgirekî baş be ku di behrê da xwe bigîhîne sedefên heqîqî. Ji bo ku xwe gîhandina sedefên heqîqî hewceye însan wekî masîgiran xwe noqî behrê bike û eger mirovekî bixwaze xwe bigîhîne fêkîyên behrê yên herî baş lazim e bi aram be (Onay, 2013: 319-320; Kalkışım, 2006: 68).

Herweku tê zanîn Mela, digel comerdîya xwe kesekî alim û zana ye û Feqîyê Teyran jî dixwaze ji ilm û îrfana wî faydeyekî bi adan bigire, lewra wî îmgeya sedefê bi kar anîye û gotîye min, selama xwe kirîye hundurê sedefê û ji Mela ra şandîye. Însan, dema bixwaze dîyarîyekî ji hezkirî û delalîya dilê xwe ra bişîne wê dîyarîyê, dixîne hundurê ambalajeka herî xweşik, herî saxlem û bi qîmet, paşê dişîne. Ji ber ku Melayê Cizîrî, ji bo Feqîyê Teyran kesekî herî hezkirî û bi qîmet e ew, sedefê layîqî Cizîrî dibîne û selama xwe dike hundurê sedefê û jê ra dişîne.

Feqîyê Teyran gelek baş dizane ku dinya, dinyayeka fanî ye û lazim e mirov bi wê nexape û axreta xwe jibîr neke. Ew weha dibêje:

*Dinê pîr e û me’lûl e*

*Ew e pêxwar e ya milxûl e*

*Ew piştqor e sîfetxûl e*

*Qewî tehl e rengkeftar e*

*Ji keftaran di lêv şûr e*

*‘Ecûz e, kevn e, devkûr e*

*Hevûreng e hêşîn pûr e*

*Heçî vêket ew xwar e*

*Heçî vêket ew î xwar in*

*Eger alim di kubbar in*

*Hemî ji bo te xemxwar in*

*Eya xûlê te xelq xwar e* (Feqî, 58/61-63)

*Tu yî xûla beyabanê*

*Heçî xelqê te dî kanê*

*Hemî xwarin di vî xanê*

*Ne sultan man ne xunkar e* (Feqî, 59/64)

Feqî, bi awayekî zelal di ferqê da ye ku ev cîhana ku ew têda jîyana xwe didomîne dinyayeka fanî ye, xapînok e, pêxwas e, piştqor e, sifetxûl e, gelek tehl e, sirtkeftar e, wekî şûrî tûj e, pîr e, pirreng e, hêşîn por e, kesên ku bûne hevalên wî teqez hatine xapandin, wê gelek însan xwarine û ew tune kirin e. Feqî, gazî li dost û hevalên xwe dike û dibêje ew însanên ku do li cem we hebûn kanê îro tune ne, kanê ew mîr û sultanên li we hukim dikirin? Mêzekin ew jî bûne tune û wehareng hûnê jî suberojê dê bibine ji tuneyan.

Feqîyê Teyran di helbestên xwe da bang li însanan dike û dibêje mirovên aqilmend, hewceye bi vê dinyayê nexapin, karê nebaş nekin, xwe ji pozbilindî, quretî û kibrê dûr bixînin û bibin kesên dilnizm, nefspiçûk û mutewazî. Eger hûn weha tevbigerin hûnê di dinyaya baqî da yanê ya heqîqî da bibin ji wan kesên serfiraz û serbilind.

**Encam**

Piştî qedandina vekolînê, encamên ku em gihêştinê bi kurtasî dikarin weha rêz bikin.

Dilnizmî, wekî fezîleteka exlaqî tê maneya tevazu, nefspiçûkî, fedakarî û nequretî yê. Feqîyê Teyran jî wekî alim û zanayên îslamê dîyar dike ku dilnizmî, di navenda îfrad û tefrîdê da cih digire, eger terazû baş neyê eyar kirin mirov dikeve îfrad û tefrîdê. Heke însan xwe têxîne dereceyeka bêqîmet, kesayeta xwe neparêze û vê yekê jî bi armanca dilnizmîyê bike, ev derece şeref û serbilindîya wî bin pê dike û ev kiryar hîç nabe dilnizmî, berevajî dibe îfrad û tefrîd.

Feqîyê Teyran, di helbestên xwe da peyva “dinizmîyê û nefspiçûkîyê” rasterast bi kar neanîye. Lê dema mirov helbestên wî di ber çavan ra derbaz dike, bi awayekî zelal û berbiçav dibîne ku wî, ji alîyekî ve xwestîye dilnizmîya xwe di helbestên xwe da bîne ziman û ji alîyê din ve jî dilnizmîyê, bi xwînerên xwe bide hînkirin û sepandin.

Li gor Feqî, dilnizmî berîya her tiştî ew e ku mirov li hember Aferînerê xwe, xwe ji pozbilindî, quretî û kibrê dûr bixîne û bi vê azînê riza Rebbê xwe bi dest bixîne. Dinya dinyayeka fanî ye û divê însan pê nexape û kar û xebatên xwe ji bo bidestxistina axretê bike. Mirovên zana û rewşenbîr ne ew kes in ku dibêjin her daîm fikra rast a me ye, berevajî ew li mirovên devdora xwe jî guhdarî dikin û qedr û qîmetê didin fikr û ramanên wan jî. Kîjan fikir û raman rast be wê qebûl dikin û dev ji fikrên nerast berdidin.

Mirovên dilnizm, dema problemek derdikeve pêşberî wan ew, di serî da problemê fêm dikin û paşê jî li çareserîya wê digerin yanê ecelekirin û biryarên demildest dayîn karê însanên dilnizm nîne. Însanên dilnizm, dema di civatekî da rûdinin ew tenê naaxifin, hewl didin ku

kesên di civatê da hene ew jî fikrên xwe bînin ziman. Dema mirovekî biaxife ew bi aramî li benda qedandina axaftina wî kesî disekinin, yanê axaftina hevalê xwe nîvco nahêlin.

Kesên nefspiçûk û dilnizm mirovên xweşbîn in. Ew, xwe wekî însanên kamil hesêb nakin û bi kiryarên dost û hevalên xwe kêmasîyên xwe temam dikin û ji vê yekê jî qet naêşin bîleks kêfxweş dibin. Mirovên dilnizm, ji alim û zanayan ra hurmetkar in û qedr û qîmeta wan baş dizanin.

Însanên dilnizm, hinek benîademan ji yên din bilindtir û qîmettir nabînin bîleks ew tevahîya mirovan wekî hev dibînin. Cudahîyên wekî cinsîyetê, milîyetê, reng û rû û hwd. sedema mezinahîyê yan piçûkatîyê nabînin. Lewra dizanin ku ev taybetîyana wan bi destê xwe qezenc nekirine berevajî Aferîner, ew dane wan û di dayînê da jî fikra wan nepirsîye.

Mirovê dilnizm û nefspiçûk xwe baş nas dike, ew ê ku xwe nas bike pir hindik xeletîyan dike. Pozbilindî berevajî peyva dilnizmîyê ye û kesê pozbilind qure ye, xwe tenê dizane, qîmetê dide kesayeta xwe tenê û çavên wî her wî dibînin.

Encama herî dawîyê ew e ku Feqîyê Teyran bang li benîademan dike û dibêje qet ji bîr nekin ew mîr û paşayên ku we qedr û qîmet dida wan îro di nav me da tune ne, ew çûne axretê em ê jî li paşîya wan biçin. Yanê ev dinya, dinyayeka bi dawî û xapînok e. Kesên dilnizm û nefspiçûk xwe bi tiştên demkî naxapînin û xwe ji pozbilindî, euretî û kibrê berdidin da ku bibine însanên muteber.

**Çavkanî**

Ayğan, Fadıl. (2013). "Şark Medreselerinde Başlangıç Düzeyinde Okutulan Akaid Risâlelerinin Tahlili", *Medrese ve İlahiyat Kavşağında İslâmî İlimler (Uluslararası Sempozyum)* Cilda IIyan, Bingöl, Weşanên Zaningeha Bîngolê.

Çağrıcı, Mustafa. (2011). "Tevazu", *Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi*, İstanbul, Weşanên Türkiye Diyanet Vakfı, 40/583-585.

Farqînî, Zana. (2000). *Türkçe-Kürtçe Sözlük*, İstanbul, Weşanên Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê.

Feqîyê Teran. (2022). *Dîwan,* (wergêr û şîkar: Kadri Yıldırım), çapa 2yan, Ankara, Weşanên Kültür ve Turizm Bakanlığı bi alîkarîya Şaredarîya Dîyarbekirê.

Hökelekli, Hayati. (2007). "Tevazu (Alçak Gönüllülük), *Dem Dergisi*, Sal: 1, Hejmar: 2, rr: 114-119.

İbn-î Manzûr. (1984). *Lîsânu'l-'Ereb*, Çapa 3yan, Qûm, Weşanên Neşru Edebî'l-Hewze, 8/ 397.

Îzolî, D. (2007). *Ferheng Kurdî-Tirkî/ Türkçe-Kürtçe*, Amed, Weşanên Deng, Çapa 5an.

Kalkışım, Muhsin. (2006). “Şeyh Gâlib Dîvânı’nda Dür Ve Sadef Objeleri”, *Journal of Qafqaz University*, Number, 18, rr. 67-71.

Mela Xelîlê Sêrtî. (1988). *Nehcu’l-Enam*, (Amd.: Zeynelabidîn Zinar), Stockholm, Weşanxana Kurdistan Publishing House of Kurdistan.

Onay, Ahmet Talat. (2013). *Açıklamalı Divan Şiiri Sözlüğü* (Amd.: Cemal Kurnaz), Ankara, Weşanên Berikan.

*Qurana Pîroz û Meala wê Ya Kurdî*. (2015). Sûreya Hucuratê, 49/13, Ankara, Weşanên Karûbarên Dîyanetê.

Samî, Şemseddîn. (1998). *Kamus-ı Türki*, İstanbul, Weşanên Alfa.